



KURMANJI

Bernameya VVS (ventîlasyon, germa û paqijiyê) û eqaran bernameyeka pişeyî ye û bidestxistina dîplomeya pişeyî armanca wê ye.

Bernameya VVS û eqaran ji te re yê ku hez dike di warê wan sîstemên tekînkî yên avahiyên yên ku germa, ventîlasyon, av û karêzê dixebitînin de û di warê xizmeta eqaran de kar bike.

Tu dikarî piştî qedandina xwendinê yekser kar bikî yan xwendina xwe li xwendîngeha bilind ya pişeyî berdewam bikî. Tu dikarî jî ji xwe re kursên zêde bixwînin da xwendina xwe li xwendîngeha bilind bidomînin.

ÇAR PISPORIYÊN CUDA

Eqar

- Tu dê zanyariyan li ser xizmetkarî, kargêrî, sexbêrî, avakirina sîsteman di saziyên teknîka enerjîyê de û wezîfeyên sîsteman û pêkhatiyên wan werbigirî. Ev pisporî îmkane dide ku tu wek, bo nimûne, teknîkerê eqaran, sexbêrkerê eqaran yan serperîştê eqaran kar bikî.

Teknîka pompeyên sarkirin û germkirinê

- Tu dê zanyariyan li ser bicihkirin, xizmetkarî, kargêrî û sexbêriya bo nimûne rê û meydanên cemedkirî, dezgehên sarkirin û cemedandinê û pompeyên germkirinê werbigirî. Ev pisporî îmkane dide ku tu wek, bo nimûne, montorê dezgehên sarkirinê yan teknîkerê dezgehên sarkirinê kar bikî.

Teknîka ventîlasyonê

- Tu dê zanyariyan li ser xizmetkarî, kargêrî, sexbêrî, pîvan, eyarkirin, wezîfeyên sîstemên ventîlasyonê yên cuda û kêmasîdîtîne werbigirî. Ev pisporî îmkane dide ku tu wek, bo nimûne, teknîkerê ventîlasyonê kar bikî.

VVS

- Tu dê zanyariyên li ser bicihkirin, xizmetkarî û sexbêriya sîstemên germkirin û paqijkirinê werbigirî. Ev pisporî îmkane dide ku tu wek, bo nimûne, montor di warê VVS, boriyên endustrî yan îzolekirina terkîbên tekînkî de kar bikî.

Tiştên ku tu dê di vê bernameyê de fêr bibî

Tu dê zanyariyan li ser bicihkirin, kêmasîdîtîna, tamîrkirin, xebitandin, sexbêrkirin, teknîka eyarkirinê û çêbikaranîna enerjîyê werbigirî. Tu dê xwe fêr bikî ku maimeleyê bi mirovên din re bikî şiyana xwe ku guh bidî pêwîstiyên wan pêşde bibî. Tu dê xwe fêrî îdarekirin û sexbêrkirina eqaran, saziyên tekînkî û sîsteman jî bikî. Tu dê zanîna xwe ka mirov çawa derametan ji bo xatirê kêmsêrfkirina enerjîyê û dêndana jîngehê bi awayekê tesîrdar bi kar tîne kûrtir bikî.

Bona mirov xwe ji zîyanên karî biparêze û tenduristiyeka baş pêk bîne, giringiyeka mezin di vê bernameyê de li ser pirsên jîngeha karî ye.

Bername weha hatiye rêxistin

Madeyên dersê di bernameyên pişeyî de madeyên lîseyê yê hevbeş in: Îngilîzî, dîrok, werziş û tenduristî, matematîk, zanist, zanyariyên dînî, zanyariyên civakê û zimanê swêdî yan swêdî wek zimanê duyê. Di bernameyên pişeyî de, tu dê zêdetir madeyên pişeyî, yê ku jê re madeyên taybetmend tê gotin, û kêmtir madeyên ku te li dibistana bingehî xwendine bixwînî. Avahî û sazî madeya taybetmend ya hevbeş ya vê bernameyê ye.

Elektrîkzanî, zanyariya sîsteman û bikaranîna alav û materyalan madeyên taybetmend yê hevbeş yê vê bernameyê ne.

Îmkan heye ku tu di bernameyê de xwe pisportir û zanatir bikî. Ji wê re bernamekûrkolîn (programfördjupning). Ji xwendîngehê bipirse ka ew kîjan kursên kûrlêkolînê dide.

Hilbijartina ferdî jî heye ku tu dikarî wê ya ku tu dixwazî bixwînî hilbijêrî. Ji xwendîngehê bipirse ka kîjan kurs hene.

Awayên xebatê

Di vê bernameyê de, tu dê şiyana xwe ya pêşkêşkirina xizmetê ji bo mitehîd, sparişker û mişteriyên xurt bikî û zanyariyan li ser îmkanên birêvebirina şirketeka şexsî werbigirî. Tu dê li ser bingehê metodên nû û yê ceribandî bi serê xwe û li gel kesên din bixebitî. Tu dê hîn bibî ku plankirin, pêkanîn, dokumentkirin û kalîteparastin ya karî bikî.

Projeya lîseyê

Tu dê di dawiya Bernameya VVS û eqaran de projeyeka lîseyê di warê pişeyî yê ku te bijartîye de amade bikî. Tu dê bi wê nîşan bidî ku zanyariyên pêdvî yê ji bo destpêkirina karê ku te ji bo xatirê wî xwendîye li bal te hene.

Fêrbûna li cihê karî

Hin beşên xwendinê herî kêmtir 15 hefteyan li cihê yan çend cihên karî bi rê ve diçin û jê re arbetsplatsförlagd lärande (apl) – fêrbûna li cihê karî – tê gotin. Ev parçeyeka giring ya perwerdeyê ye. Apl tecrîbeyan û herweha kontaktan yê ku dikarin di dema lêgerîna karî de ji te re bisûd bin dide te.

Şagirdîkirin

Heger xwendîngeh di çarçoveya bernameyê de perwerdeya şagirdîkirinê ya lîseyî pêşkêş bike, tu dikarî wê hilbijêrî. Maneya wê ew e ku tu dê heman zanyariyan werbigirî lê dê herî kêmtir nîva xwendina xwe li cihê yan çend cihên karî bikî.

Balkişandin

Giring e ku tu xwendina xwe plan bikî heger tu bixwazî şertên bingehî yê xwendina bilind bi dest bixî. Ji bo bidestxistina şertên bingehî yê xwendina bilind tu dikarî li gor dilê xwe di çarçoveya hilbijartina ferdî û bernamekûrkolînê de, heger xwendîngeh wê pêşkêş bike, kursên pêdvî bixwînî. Ew du kursên zêdetir yê zimanê swêdî yan swêdî wek zimanê duyê û kurseka zimanê Îngilîzî ne. Heger tu bixwazî hêjî bixwînî, li gel rêberekê xwendin û pişeyê biaxive.

Hergav mafê te heye ku tu di çarçoveya hilbijartina ferdî de kurseka din ya zêde di warê werziş û tenduristiyê de û kurseka hunerê hilbijêrî.